

Ezê çawa bikaribim dibistana lêhatî ji bo zarokê xwe yê hewceyî alîkariya taybet ya pedagojîk heye bibînim?

Pewîstiya we ji bo bingeheke agahdariyê ya têr û tijî heye, da ku hûn bikaribin dibistana guncaw ji bo zarokên xwe hilbijêrin û fêde jê bigrin.

Biryara misoger ya hilbijartina dibistana lêhatî, girêdayî nirxandina we ye, gelo di pêşerojê de ji bo pêşveçûna zarokê we, çûyina wî bo dibistaneke înkusiv an dibistaneke alîkar dê bibe baştirîn alîkarî.

Ger zarokê we nû dest bi dibistanê bike, agahdarî û nirxandinên hemû sazî, dezgeh û kesên ku pêşveçûna zarokê we ya beriya dibistanê de bi wî re mijûl bûne, girîng in. Her weha, ji bo derfetên alîkariyê ji dibistanên seretayî û yên alîkar yên têkildar û berpirsiyar agahdarî bi dest bixin.

Di dawiya dibistana seretayî, hûnê li ser qabîliyet û taybetmendiyan zarokên xwe bi firehî agahdarî û ji bo dibistaneke nû pêşniyarek bigrin. Dîsa jî, ji bilî wan, li ser derfetên alîkariyê ya dibistana nû a ku hûnê hilbijêrin û dibistana alîkar ya têkildar agahdarî bigrin.

Ger hîn jî pirsên we hebin an jî hûn li ser biryara xwe bi guman bin, dikarin cihên li jêr binavkirî agahdarî û şewirdariyên zêdetir bigrin.

Kî biryar dide, gelo pêwîstiya zarokê min ji bo alîkariya taybet ya pedagojîk heye an na û ev alîkarî bi çi awayî divê bê pêk anîn?

Beriyar despêka dibistanê, hûn dikarin di qeydkirina zarokê xwe de, bi riya birêvebirîya dibistana seretayî ya berpirsiyar, ji bo kontrolkirina zarokê xwe, gelo hewceyî alîkariya taybet ya pedagojîk e an na, serlêdanek pêk bînin. Li ser vê rewşê birêveberiya dibistanê agahdariyek têr û tijî dê bide we û di serlêdanê de alîkarî û şewirdariya we bike. Her weha di çarçeva kontrolkirina ji bo despêka dibistanê ya ji aliyê Buroya Tendurustiyê (Gesundheitsamt), hûnê şewirdariyek têr û tijî bigrin. Li ser despêka pêvajoyê birêvebirîya dibistanê biryar dide.

Ger di pêvajoya berdehamiya dibistanê de derfetên dibistanê têrê nekin, da ku di riya fêrbûna îndîviduel de alîkarê zarokê we bibin, birêvebirîya dibistanê her gav dikare riya kontrolkirinê hilbijêre, da ku zarokê we alîkariya taybet ya pedagojîk bigre. Her weha di vî warî de jî dê û bav ji birêvebirîya dibistanê alîkarî û şewirmediyeye têr û tijî digrin.

Zarok û ciwan jî, di çarçeva alîkariya taybet ji bo mirovên xwedî astengiyên bedenî, dikarin ji alîkarê tendurustiyê yê dibistanê daxwaz bikin, da ku ew jî bikaribin biçin dibistanê. Mafê dê û bavan jî heye, ku ji bo alîkariyê bi vî awayî serî li Buroya Beşdarî û Civakî (Amt für Teilhabe und Soziales) bidin. Cure û rewş, piştî pêwîstiya îndîviduel ya zarokê dê bê nirxandin.

Kî agahdarî dide?

Bervêdar û şewirdarê yekemîn her gav divê bibe birêvebirîya dibistana seretayî, ya dibistana navîn an jî ya hêlinan. Bervêdar û şewirdarên din ev in:

#### Schule am Bürgerbusch

Focus on learning  
Ms Behrens, Telephone: 0441 302537  
Fax: 0441 3047870  
info@schule-am-buergerbusch.de

#### Schule an der Kleistraße

Focus on mental development  
Ms Stodiek, Telephone: 0441-955060  
Fax: 0441 9550-611  
sekretariat@schulekleiststrasse.de

#### Schule Borchersweg

Focus on the development of physical and motor skills  
Mobile service "Seeing"  
Mr Völkel, Telephone: 0441-2058621  
Fax: 0441 2058630  
info@schule-borchersweg.de

#### Schule Sandkruger Straße

Focus on mental and social development  
Mr Schubert, Telephone: 0441-219668-80  
Fax: 0441 21966-89  
schule-sandkruger-strasse@web.de

#### Regional Educational Center for the Hearing Impaired

(Landesbildungszentrum für Hörgeschädigte)  
Focus on hearing  
Mr Noël  
Contact person for information:  
Mr Behrens  
Telephone: 0441-9505-305, Fax: 0441 9505-130  
poststelle@lbzh-ol.niedersachsen.de

#### Primary School (Grundschule) Bürgeresch

Offers remedial classes (Förderklassen) in language  
Ms Kühme-Jahnke  
Contact person for remedial classes in language  
Ms Sante, Telephone: 0441-82795 or 82761  
Fax: 0441 8853188  
info@gsbuergeresch.de

#### School Authority of Lower Saxony

(Niedersächsische Landesschulbehörde)  
Regional Division Osnabrück  
Oldenburg Office  
Telephone: 0441-9499823, Fax: 0441 94998-98  
www.landesschulbehoerde-niedersachsen.de

#### City of Oldenburg

(Stadt Oldenburg)  
Office for Participation and Social Affairs  
(Amt für Teilhabe und Soziales)  
Service telephone: 0441-235 4444  
servicecenter@stadt-oldenburg.de

#### Department of Schools and Education

Inclusion in Oldenburg schools  
Telephone: 0441 235 2336, Fax: 0441 235-2638  
schule-inklusion@stadt-oldenburg.de

#### Department of Public Health

Child and Youth Health Services  
Telephone: 0441 235-8645  
gesundheitsamt@stadt-oldenburg.de

#### BeKoS

Advisory and coordination office for self-help groups  
Telephone: 0441-884848  
Fax 0441 883444  
info@bekos-oldenburg.de

#### Weşanvan:

Bajarê Oldenburgê (Oldb), Serokşaredar, Buroya Dibistan û Perwedahiye, Mijdar 2015, ji bo agahdariyên giştî li ser Şaredariya Oldenburgê ji kerema xwe re Navenda Servîsê bigerin: Telefon 0441 235-4444.

Înkusyon li dibistanên  
Oldenburgê



Foto: Uwe Wagschal/Pixelio.de

Pirtûkokeke  
agahdariyê ji bo  
dê û bavan

## Agahdarî

**Şaredariya Oldenburgê û Koma Xebatê ya Hilbijartina Dibistana Baştirîn ya Zarokan bo Dibistanên Oldenburgê**, bi vê belgeya agahdariyê, dixwazin li ser derfetên çûyina dibistanên lêhati ji bo zarokên we haydarî û agahdariyên kêrhati pêşkêşî we bikin. Ev agahdarî, bingeha şewirdariyê ye ji bo malbatan, ku ji aliyê dibistanan, Buroya Tendurustiyê (Gesundheitsamt), Buroya Beşdarî û Civakî (Amt für Teilhabe und Soziales) û Buroya Ciwan û Malbatan (Amt für Jugend und Familie) hatiye amade kirin

**Koma Xebatê ya Hilbijartina Dibistana Baştirîn ya Zarokan bo Dibistanên Oldenburgê**, di hilbijartina baştirîn dibistanê de alîkarî û pişgiriya Şaredariya Oldenburgê dike. Nûnerên dibistanan, yên Şewirdariya Xwendekarên Bajêr, Şewirdariya Malbatên li Bajêr, Buroya Dibistanan ya Herêmi, Saziyên Serbixwe ên Alîkar bo Ciwan û Astengdaran (Seqetan), nûnerên Komele, Komên Alîkariyê yên Serbixwe, yên siyasetmedar, birêvebirî û zanyaran, endamê vê komê ne.

## Înklyuson çî ye?

Eslê wî ji kîjan neteweyî dibe bila bibe, rewşa wî ya civakî û aborî çî dibe bila bibe, çî kêmasiyek wî ya bedenî an heginiyek wî hebe an jî taybetmendiyên wî yên civakî an jî kesayeti hebin, mafê her mirovî heye, ku bi rengekî wekhev bikaribe beşdarî her qada jiyane bibe.

Mafê her mirovî heye, ku rûmet li taybetmendiyên wî yên bêhempa bê girtin. Pirrengî û cudatiyên mirovan dewlemediya civata me ye. Her weha ev mafê xwendevanên keç û xort, malbat û perwerdekaran e jî.

Ji bo vê yekê divê em ji aliyekî astengî û sitembariyan ji holê rakin û aliyê din jî divê bê tespît û nas kirin, ku kî hewcedarî alîkarî û pişgiriye ye, da ku bikaribe taybetmendiyên xwe pêşve bibe.

## Plana demî ya ji bo Despêka Hilbijartina Dibistana Baştirîn wê bi çî awayî bibe?

Heta nuha xwendevanên keç û xort yên ku pêwîstiya wan ji bo alîkariya pedagojîk ya taybet hene, diçûn dibistanên adetî. Rewşa nû ew e, ku di sala perwedehiyê ya 2013/2014´an vir de, mafê malbat û zarokan heye, ku ji bo hilbijartina dibistana baştirîn daxwaza fermî bikin. Di Qanûna Dibistanî de hatiye eşkere kirin, ku heta sala perwerdehiyê ya 2024/2025´an rewşeke demdar dê hebe, ji ber ku her dibistan bi giştî amade nîne ku dersên înklyusîv bide xwendekarên. Li bajarê Oldenburgê biryar hatiye girtin, ku zûtirîn demê de ev rewş pêk were û înklyuson bê sepanandin. Ji ber vê yekê jî hemû dibistanên Oldenburgê, di sala perwedehiyê ya 2013-2014´an vir de, di çarçeva derfetên xwe de hewl didin ku dersên înklyusîv pêk bînin. Di salên pêş de dibistan ji nû ve dê bîn ava û nûjen kirin, da ku ji bo înklyusonê rewşeke baştir bi dest bixin.

Dibistanên seretayî yên Oldenburgê, ji 2013/2014´an vir de hîn diçe zêdetir zarokên sinifa yekan ku di çarçeva înklyusonê de hewceyî alîkarî û pişgiriya taybet ya pedagojîk in, digrin. Bingeha perwerdehiya alîkariyê bi van xwendekarên ve girêdayî ye. Ji bilî vê, ji bo alîkariyê, pêşveçûna hesteyî û civakî, a ziman, rewşa bedenî û giyanî, pêşveçûna dîtin û bihîstina zarokan dibe bingeh da ku wek dê û bav, hûn bikaribin biryar bidin, ku zarokên we biçin dibistana seretayî an ya taybet.

Her weha dibistanên navîn jî, ji 2013/2014´an vir de hîn diçe zêdetir xwendevanên sinifa pêncan ku di çarçeva

înklyusonê de hewceyî alîkarî û pişgiriya taybet ya pedagojîk in, digrin. Di vir de jî wek dê û bav mafê we ji bo her reng alîkariyê heye û hûn dikarin biryar bidin, ku zarokên we biçin dibistaneke giştî an yeke taybet.

## Dersên înklyusîv dikare ji bo xwendevanên ku hêsantir dersan fêr dibin bibe paşwendî (dezavantaj)?

Hemû xwendevan (çî keç û çî law) ji dersên înklyusîv sûd werdigrin. Awa û mercên dersan yên îndîvîduel, yek bi yek derfet li hemû xwendevanên keç û law dide, ku alîkarî û dersên taybet baştir plan bikin û pêk bînin.

Lêkolînên pirhejmar yên li dibistanan eşkere kirin, ku di hêzdariya serketinên xwendevanên keç û law yên di dibistanên înklyusîv de, tu paşwendî nîşan nadin. Bi hev re karkirin û lihevkerinên civakî û nîrxandinên kar û xebatên hevdu yên xwendevanên keç û law, di dersên înklyusîv de, alîkarî û pişgiriye taybet digrin.

## Biryara hejmartina dê û bavan tê çî wateyê? Gelo ez dikarim di pêşerojê de hilbijêrim, ku zarokê min biçe kîjan dibistanê?

Ger pêwîstiya zarokê we ji bo alîkarî û pişgiriya taybet ya pedagojîk hebe, mafê we heye ku bi riya agahdariya înklyusonê biryar bidin, gelo zarokên we biçe dibistaneke giştî an ya taybet, da ku alîkarî bigre.

Di Qanûna Bingeîn de hatiye pesend kirin, ku bê awarteyî mafê hemû zarokan (ci keç û çî law) heye ku biçin dibistaneke giştî ya di herêma de, her weha dibistanên navîn û gymansiyûman. Ji bo destxistina cihek di gesamtschule an jî dibistaneke navîn an

gymnasyumeke taybet nikare bê garanti kirin. Li gor rewşa serlêdanan, ger pêwîst be, divê formeke dibistanê û dibistaneke din bê pêşkêş kirin.

Derengtirîn di sala perwerdehiyê ya 2024/2025´an de, hemû dibistanên Oldenburgê dersên înklyusîv yên bê kêmanî wê pêşkêş bikin û ev rê û rêbaz û maf, ji bo zarokên hewceyî alîkariya taybet ya pedagojîk in jî, bê kêmanî wê bê dayîn. Heta wê demê, ger sedemêke bingehîn ya qeydkirina dibistana înklyusîv hebe, wek rewşeke awarte, çûyina dibistaneke giştî a din dikare bibe çareseriyê demî.

## Gelo ez dikarim biryar bidim ku, ji ber pêwîstiya alîkariya taybet ya pedagojîk, zarokê min biçe ne dibistaneke înklyusîv, lê belê biçe dibistaneke alîkar?

Ger pêwîstî ji bo alîkariya taybet ya pedagojîk hebe, hûn dikarin di navbera dibistaneke giştî an jî dibistaneke alîkar biryar bidin, ku zarokên we biçe.

Di vî warî de rewşa awarte ev e, ku divê di fêrbûnê de pêwîstî ji bo alîkariyê hebe. Di sala perwedehiyê ya 2016/2017´an de, zarokên keç û law ku di fêrbûnê de hewcedariya alîkariya taybet in, dê di dibistanên bingehîn yên berpirsiyar de bîn qeydkirin. Bi despêka sala perwerdehiyê ya 201/2018´an ve, zarokên keç û law ku di fêrbûnê de hewcedariya alîkariya taybet in, bi despêka sinifa pêncemîn ve, ji bo dibistanên giştî yên navîn dê bîn qeyd kirin.

## Rewşa serlêdanê bi çî awayî dimeşe?

Rewşa serlêdanê li Oldenburgê weha dimeşe: Hûn zarokên xwe yên hewceyî alîkariyê ne, di despêkê de wek hemû zarokên din, di dibistaneke giştî de qeyd dikin. Di dibistanên seretayî de divê zarok di dibistaneke nêzî mala we ye (Grundschulbezirk) bê qeyd kirin. Di dibistanên navîn de zarokên xwe di forma dibistan û dibistanên gor daxwaza xwe qeyd bikin. Dibistanên ku wek „dibistanên taybet“ tên bi nav kirin, li Oldenburgê nîn in.

Ji ber ku pêwîstiya îndîvîduel ya xwendevanên keç û law cuda ne û hemû dibistan di despêka avakirinê de ji bo van rewşan nehatine techîz kirin (cihên bê asteng, odên taybet û hwd.), li wir, di dibistanê de biryar bê dayîn, gelo zarokê we bê astengî ders bigre an na. Ger rewşeke awarte pêk were û ev derfet tune be, dê pêşniyar li we bê kirin, kîjan dibistana giştî ji bo we lêhatî û guncaw e.